
Kurdisch

Gewaltprävention
MiMi Mit Migranten für Migranten

# Perwerdekirina azad ji tund û tûjiyê- çawa dibe?



Rêbernameya malbatê ji bo kesên perwerdekar ên penaber û koçberan


Bi alîkariya:

Die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

## Impressum

Gewaltfrei erziehen – wie geht das?
Ein Familienratgeber für Geflüchtete und neu zugewanderte Erziehungspersonen

**Herausgeber:**
Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstraße 6, 30175 Hannover

**Konzeption, Inhalt, Erstellung:**
Duale Hochschule Baden-Württemberg Villingen-Schwenningen (DHBW)
– Institut für Transkulturelle Gesundheitsforschung

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V. (EMZ e.V.)
– MiMi Integrationslabor Berlin (MiMi Lab)

**Förderung:** Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

**Projektleitung:** Ramazan Salman (EMZ e.V.), Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan (DHBW)

**Redaktion:** Ahmet Kimil, Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan, Claudia Klett, Anette Metzger, Anne Rosenberg, Andreas Sauter, Ramazan Salman, Silvio Schelle, Soner Tuna, Prof. Dr. Haci-Halil Uslucan, Prof. Dr. Hans-Peter Waldhoff

**Layout und Satz:** eindruck.net, 30175 Hannover

**Illustrationen:** deanhills.com, 55130 Mainz

**Übersetzung:** Dolmetscherdienst – Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Alle Rechte vorbehalten. Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Jede Verwendung in anderen als den gesetzlich zugelassenen Fällen bedarf deshalb der vorherigen schriftlichen Genehmigung durch den Herausgeber.

Diese Publikation können Sie jederzeit über die Webseiten „www.mimi-gegen-gewalt.de" oder „www.mimi-bestellportal.de" in folgenden Sprachen anfordern:
Arabisch, Bulgarisch, Dari, Deutsch, Englisch, Farsi, Französisch, Kurdisch, Paschto, Polnisch, Russisch, Serbisch/Bosnisch/Kroatisch, Spanisch und Türkisch.

1. Auflage · Stand: November 2019

# Derwaze

Pêdiviye zarok û genc bi bextewarî mezin bibin. Pêdivî ew bi hêz û bixwe bawer bibin bikaribin jêhatbûna xwe ta dawî pir bikin. Zarok hêviya paşeroja me ne. Ev rêbername alîkariyê bo parastina zarokan di rêka azadbûna ji tund û tûjiyê di nav malbatê de. Parastina ji tund û tûjiyê erkekî pir giring e ji bo me hemiyan, ji bo dê û bavan û her weha kesên perwerdekar jî.

Ramanên li dor çawa pêdiviye zarok were perwerdekirin û çawa dê û bav an jî her mirovekî bi vê babetê ve têkeldar û zarok serederiyê bikin, û ciyawaziyê di navbera vê civatê û wê civatê de nas bikin. Ji bo ko em bikaribin di nav welatekî biyanî de baş bi hev re bijîn, Pir alîkar e jî ko pergala perwerdehiyê û qanûnên têkildar ên vî welatî bizanibin û têbigehên.


Ji ber vê yekê Beşa 1 ya vê Rêbernameyê ramanên li ser perwerdehiyê li Elmanyayê û mafên girîng û daxwazên qanûnî destnîşan dike.

Di Beşa 2an de behsa coreyên cuda ên tund û tujiyê ên dikarin li dijî zarokan pêk werin û heybûna encamên wan, tund û tûjiya di navê malbatê de, her wisa serpêhatiyên cengê- derbideriyê- û penabertiyê dihêlin tendurustiya zarokan ya derûnî têkeve bin metirsiyê de.

Di Beşa 3an de behsa, ka çendî giring e, ko di perwerdekirinê de tund û tûjiyê bi kar neyê û ji dêvla wê de evîndariyeke tewaw bi kr were di bihêzkirina perwerdehiyê de. Pirrê caran, ew kesên perwerkar in ên rêbazên tund û tûjiyê bi kar tînin. Ev tund û tûjiyê jo sala 2000 de, bi yasayî hatiye qedexekirinê.

Di Beşa 4an de, agahî li derora, ka dê û bav û mirovên perwerdekar, li dema pirs û xemên wan li dor perwerdê hebin, berê xwe bidin kê.

Perwerdehiya bê tun û tûjî ew mercê giring ji bo, ko zarokên me tendurust, parastî û bi hezkirin mezin bibin.



# Naverok


## 1. Malbat û Perwerdekirin li Elmaniya ........................................ 4

Armanc ên perwerdehiya zarok û gencan li Elmaniya çi ye?
Çi mafên yasayî ên zarok û dê û bavan li Elmaniya hene?

## 2. Tundûtûjî li dijî zarokan ........................................ 10

Çi Taşe ji tund û tûjiyê serketina perwerdehiyê asteng dikin?
Encamên vê tundûtujiya li ser pêşdeçûna zarokî çi ne?
Çima tundûtûjiya ji hêla malbatê ve tê xwedan encamên taybet in?
Çi karîgeriya cengê, derbederiyê û traumayê li ser perwerdehiyê heye?

## 3. Tund û tûjiyê di Perwerdehiyê de ........................................ 16

Ma tun û tûjî dikare bibe alavekî perwerdehiyê?
Li dema zêdeyî karîna be û belegaz be dikarim çi bikim?
Çawa dikarim zarokan bi rêka Perwerdê bi hêz bikim?
Çi pêdivî ye ji perwerdehiyêdi pey derbederî û penabertiyê zanibim?

## 4. Parastina zarokan li Elmaniya ........................................ 19

Ez karim alîkariyê bikim?
Çi reng ji alîkariyê saziya alîkariya zarok- û genca pêşkêş dike?
Kengî Saziya gencan dikar maytêkirinê di perwerdehiyê de bike?

## Ferhengok ........................................ 22

## Adrêsên têkiliyê bo pêşkêşiya alîkariyê ên bijarte .................. 24

# 1. Malbat û Perwerdekirin li Elmaniya

Zor kes ji wan penaberan hene, yên hatine li vî welatî dijîn, ko li welatê wan nêrîna wan li ser perwerdekirina zarokan pir ciyawazî li vir li Elmaniya heye. Ev dikare bibe sedema, bargiraniyekê, tevîhevbûnekê û peydabûna kêşeyan, dema ko dê û bav û zarok jî rêmayên ko li Elmaniya bi rê ve diçin nas nekin.

## ARMANC ÊN PERWERDEHIYA ZAROK Û GENCAN LI ELMANIYA ÇI YE?

Dema ko pirs tê ser perwerdehiyê, di civakên rojavayî de mîna ya Elmanyayê bal tê kişandin ser pêşkeftina jêhatîbûn û kesayetiya her zarokekî bi xwe û li ber çav tê girtin. Zarok xwedan mafê pêşkeftina kesayetiya xwe û yekbûna laşî/fîzîkî ya ji dayikbûnê ve jî heye. Rol û erkên dê û bavan û pergala perwerdehiyê (Di nav de jî baxçe zarokan û dibistan) ew e, pêştevaniya pêşketina laşî, hestane û giyanî ya zarokî were kirinê. Divê zarok bikaribe nerîneke xwe ya serbixwe bi pêş ve bibe û xwediyê wê be. Divê zarok fêr bibe ko di heman demê de berpirsiyarî ji bo xwe û civakê jî bigirin.

Ji bo ko pergala perwerdehiyê li Elmaniya were têgehiştin, lewra giring e, prosesa pêşveçûnê ya zarokan were naskirin. Ev dikare li ser du qunaxan wer bi parvekirin.

### ZAROKATÎ

Zarokatî qûnaxek e ji roja jidayîkbûnê tanî bi destpêka salên sinêliyê. Li gor yasayên li Elmaniya ji bo zarokan, yên hîn nebûne 14 sal.

Di zaroktiyê de, kurs ji bo pêşerojê tê danîn. Zarokatî bingeha ku li ser her tiştê ku tê avakirin e. Ji ber vê yekê, pêşveçûna zarokê baş û tendurist bi taybetî girîng e. Qabiliyet û helwestên ku di zaroktiyê de digirin jiyana.

Hemî zarokên temenê wan ji 6 salî û banîtir e, keç be an kur be, dewlemend be, an jî belengaz be, elman be an jî ne elman be, mafê wî û erkê wî here dibistanê. Dê û bav li gor yasayê berpirsiyar in û erkê wan e, ko bihêlin zarok bi kêmanî 9 salan seredana dibistanê bikin. Ji bo Malbatên penaberan demê bi sînorkirî taybet hene, çiqas ji wan re divê, di pey gehiştina wan ya Elmaniya re ko pêdivî be biçin dibistanê. Eve jî girêdayî her iyaleteke federal ve ye.

Zarok bi mezinbûna xwe re dikarin bi erkê karûbarên malê rabin û bigrin hustuyê xwe. Pêdiviye, erkê û wezîfeyên bi malbatê ve girêdayû nabin sedema piştguhxistina dema seredana dibistanê, bidawîkirina erkên malê, ji bo pêşkêşiyên bihêzkirina zarokî, lê yariyên dema bêhinvedan û valabûna.

**Zarok li gorana yasaya parastina gencan ji karî bi giştî nikare kar bike. Rewşên awarte hene, bo nimûne 13 ew dikarin alîkariyê salîu delîve heye, ko kar bike. Ji bo xercikirina li jiyana wan yên berpirsiyar Bav e. Di demên pêdivî de, alîkarî di rêka bajarvaniyê ve tê.**

Di gel pêşdeçûna kesayetiya zarokî û fêrbûna wî parastina wî û tenahiya wî jî pir giring in. Zor caran gelekî zor e zarok tiştên metirsîdar û tiştên imkana xetereke rastî jê hebe rast texmîn bikin, lewra jî ew bizûtir ji temen mezinan dibin qurbana tund û tûjiyê.

## GENC

Yê genc li gorana yasaya elmaniya yê ew yê temenê wî 14 salî be, lê hîn negeha be temenê 18 saliyê. Di qûnaxa gencatiyê de ew guherîna ji zaroktiyê bo kamilîbûn mirovî ye. Li vê qûnaxê gehiştina gewdeyî, laş û giyanî li holê ye.

Gencên zaniyariyên xwe di dibistanê de kûr dikin, dako ew wan pêzanînan di jiyana rojane û di pey re di pîşeyê xwe de bikar bînin. Di vê qûnaxê de biryar li ser pîşeyê demên li pêş wî an jî destpêka hînbûna pîşeyekî tête danê. Di gelek eyaletên dewleta federal ya Elmaniya de genc xwedan maf û erk in, ta temenê wan bibe 18 salî biçin dibistana hînkirinê ya giştî, wate dibistana pîşeyî. Di dema hilbijartina pîşeyî de, pêdiviye şêwirmendî ji bo dê û bavên şagirtan jî peyda bibe, lê ne ew biryarê bistînin. Keç jî heman maf wekî gencên kur hene, ko bi azadî pîşeyê xwe hilbijêrin.

Ew têkiliyên ko di nav hevalên temenê wan nêzîkî hev be giring e. Pir caran ew têkiliyên evînî ên destpêkê, ên mîna amadebûnê ji bo hevjîniyekê û di paşerojê de dikare hîmê malbatê were danîn.

Nêzîkahî û têkiliya cinsî di navbera dostên bi hev re, li gor yasayê rêpêdayî ye. Temenê gehiştinê li Elmaniya ji 18 saliyê ve dest pê dike. Serederiyên cinsî di navbera yeke/î salên wî gehiştî yekî/e 14 salî di hundurê yasayê de qedexe sizabarî ye. Ev wisa ye, çendî yê/a 14 salî bipejirîne jî. Li gor *pirtûka yasayî ya sizayê** ev serederî mîna „Destdirêjiya cinsî" li zarokan li gor (§ 176, Abs 1) hatiye danîn.

Şîkirin, girêdana hevjîniyê li Elmaniya li gor pirtûka yasayî ya medenî ji jiyê 18 salî ve destûrdayî ye (§ 1303). Di pirtûka yasaya sizadanê de hatiye destnîşankirin, ko mafê tu kesekî tun e ye, temenê wî çend be, di rêka tund û tûjiyê û tehdîdê de peymana şîkirinê girêde. Eve bi xwe guvaşeke sizabr e li gor yasaya (§ 237).


Ev tiştekî normal û xwezayî ye, ko di qûnaxa gencatiyê de, gelek sînordayîn ji hêla dê û bavan ve werin danîn. Ev dikare kêşeyan û bîr û baweriyên ciyawaz di navbera dê û bavan û gencên wan de çê bibin. Ev pirsgirêk nîşan in ji bo, ko zarok bi xwe kesayetiya xwe bi pêş de bibe û ew bi xwe berpirsiyariya xwe bi

** Di ferhengokekê de ev têbînî di tekst de meyl hatin*

xwe rabe. Erka dê û bavan ev e, ko di gel gencan biçin û bên û li gorana temenên wan azadiyê bide wan û erkan jî bispêre wanan, wan berve berpirsiyayê ve bibe, dako bikaribin baş perwerde bibin.

> **!**
> **„Eger tu zarokekî biçûk bî, pêdiviye em te ji rehên te bigirin, Lê eger tu hinekî mezin bûbî, pêdiviye em bask û peran diyarî te bikin.“**
> **(eve jî pendeke hindayn e)**

Di vê qûnaxê de, gelek pirs û xem bo dê û bavan, yên bi perwerdehiyê ve girêdayî durust dibin, Serederiya di gel kêşeyan û danîna sînoran bo wanan. Ev pirsgirêk û xemxurî dikarin bêpere û li ser daxawzên nepenî di gel karmendên pisporan ji navendên şêwirmendiyê ên perwerdehî an di gel dê û bavan were axaftin.



## ZAROKÊN KÊMENDAM

Mafê mirov ên kêmendam weke mirov ên ne kêmendam, bi baştirîn rewş di karîna mezinbûn û bi pêşdebirina hizrî, laş û giyanî zarokatî û gencatiyê de heye. Pêdiviye ew derfet û delîve bo wan hebe, ko bikaribin biryarê bi xwe bidin. Pêdiviye weha derfet hebin, ko bikaribin bê sînordayîn di civatê de beşdar bibin, bo nimûne di dibistanê de û fêrbûna pîşeyî de. Eve daxwazên taybet di warê fêrbûn û perwerdahiyê de ferz dik û her weha jî têkiliyên dê û bavan û zarok bi hev re.

Kêmendametî dikare.

- bi sedema kartêkirinên laşî/fîzîkî hebin, ew ên derfetdayîna livandinê an kêmasî di regezên hespêbûnên din hebin (dîtin an bihîstinê) bi xwe ve bigirin. Di wê rê re zehmetî di livandin û dan û stendinê de peyda bibe.
- Kartêkirin li tendurustiya giyanî ya zarokî heta hetayê bike, bo nimûne di rêka nexweşiyên derûnî ve. Eve dikare bibe sedema ko zarok di qûnaxeke dirêj demê bistîne, ko ev zarokane pir zêde bêhinteng be, xwe bipelîne û xemgîn be û bixwaze têkiliyê neke. Di vê rêkê de, zarokê kêmendam bi têkiliyên bi mirovên saxlem re an jî di baxçê zarokanan an jî dibistanê zehmetiyan derbas bike.
- Bi sedema kemûkuriya kapasîtiyên rewşenbîrî, ko ferzend û delîveyên têgehiştinê, yê fêrbûnê, cedîwergirtinê an ragehandinê sînordar in.

Ji bo dê û bavan ên zarokekî wan î kêmendam hebe, pirê deman pirs û neewlehî derdikevin pêş. Eve girêdayî bi serederiya di gel zêrok, perwerdehî û delîveyên piştgiriya darayî li nav malbatê. Geriyana li baxçeyekî zarokan î guncayî, li dibistanekê an jî fêrbûna pîşeyekî guncayî pirê caran zor e. Lê ev dikare di rêka nepejirandina muhtemel an jî rêlêgirtina li zêrok di rêya endamên malbatê an di rêka komelgehê re dikare ji dê û bavan re bibe stêrsek.

Li Elmaniya alîkarî- û piştgiriyên yasay ên cuda cuda hene, ko dikarin werine pêşkêş kirin, ko rê li ber kemûkuriyên ji bo zarokên kêmendam derdikevin bigrin. Wan tiştên ko bi xwe ve digirin, bo nimûne baxçeyên zarokan ên xwedan alîkriyên taybet, dibistanên taybet an ew alîkariyên ko dihêlin beşdarî dibistanê an jî saziyên rahênanê bibe. Ev jî bi pêdiviyên taqekesane yên zêrok û malbatê bi xwe ve girêdayî ne.

Malbat dikarin hin alîkariyên din ên bi rojane têne pêşkêşkirin li „Karûbarê Piştgiriya Malbatê" û „Karûbarê alîkariya Malbatê bibînin. Ev Xizmetguzarî piştgiriyê didin dê û bavan û her weha xwişk û birayan û wisa jî zaroka kêmendam. Dê û bav biryarê distînin, ka çiqasî piştgiriyê dixwazin. Berpirsiyaretiya xizmetguzarî û perwerdehiyê di destê dê û bavan de ye.

Yek ji **girintirîn saziya danûstendinê** bo dê û bavên zarokên kêmendam ew bijîjkê- bijîjka zarokan ne. Ev dikarin derbaskirinekê ji bo saziyên pêdiyatrîk ên civakî binivîsin (SPZ), ên ko alîkariyên berfereh pêşkêş dike, bo nimûne pişkinînên pisporiyên curbicur, destnîşankirin û şêwirmendiya ji bo dê û bavan, li dor hemî alîkarî-û delîveyên piştgiriyê. Û van pêzanîna jî didin perwerdekarên baxçeyên zarokan, mamosteyên dibistanan an karmendên civakî ên li kampên giştî li dor van pirsan.

Eger zehmetiyên têgehiştinê bi sedema nezanîna zimên hebe, pêdiviye wergervanek peyda bibe. Hin belavokên agahiyan bi hin zimanan jî hene, ko diyar dikin ka çi alîkarî bo zarokên kêmendam têne pêşkêşkirin. Di hin bajaran de, komên piştgiriyê, ji malbatên koçber û penaberan ên zarokên wan î kêmendam hene, hatine avakirin, dako xwedanên kêmendaman alîkariya hev bikin.

Bi karanîna alîkariya hatiye şirovekirin li vir çi kartêkirin û şopên xwe ên nerênî li pirs û yasaya penabertiyê û mafê manê, nakin. Ew zarokên kêmendam ew in yên pêdivî xizmetên taybet in. „Ew destûrdayîna mafê manê ji bo demeke diyarkirî parastiye" eve jî li gor (§ 24. xeleka. 1), ko mafê wan e alîkariya nojdarî ya tê xwestin û hin alîkariyên din, mîna yasayî xizmeta yê penaber ko hatiye teqezkirin (§ 6 xeleka. 2) werbigirin.

## ÇI MAFÊN YASAYÎ ÊN ZAROK Û DÊ Û BAVAN LI ELMANIYA HENE?

Perwerdehî û serederiya ji hêla dê û bavan û zarokan li Elmaniya federal di rêya yasayên cuda cuda de tê destnîşankirin:

### DESTÛRA BINGEHÎN (GG)

Zarok ên li Elmaniya federal ji dema jidayîkbûnê ve xwedan eynî *mafên bingehînin* mîna mezinan. Ev hemî di destûra bingehîn ya komara Elmaniya Federal de heye.

Mafên bingehîn ên giring di destûra bingehîn de hene:

- Kerameta mirovî parastiye. Rêzgirtin û parastina wê erkekî di ser hemî tundiya welatî re ye (Tişta 1, paragraf. 1)
- Mafê her yekî heye kesayetiya xwe bi azadî berfereh bike, lê ko mafê kesekî din birîndar neke û ne li dijî destûrê û rêmayên wê bin an jî li dijî tîtalên civakê bin (Tişta 2, paragraf 1)
- Mafê her kesekî di jiyanê û saxlemiyê lêş de heye. Nabe mirov dest bavêje azadiya mirovê. Di vê destûrê nabe mirov maytêkirinê di yasayê, ko tenê ne li gor (Tişta 2, paragraf 2)

Zarok ji roja bûna xwe de xwedan hemî nirx in bi mafên xwe û erkên xwe ve. Erkê dê û bavan e, ko alîkariya zarokên xwe bikin, ko serbixwe karên xwe bi rê ve bibin. Ew maf û erkê dê û bavan ko zarokan ta bigihin temenên xwe yên kamilbûnê, wate ta 18 salî xwedan û perwerde bikin (Tişt 6, paragraf 2 ji destûra bingehîn). Pêdiviye xwedankirin û perwedekirin xizmeta pêşdeçûnên zarokî bi erênî bike.

### PEYMANA MAFÊ ZAROKAN YA NETEWEYÊN YEKGIRTÎ

Di bendê Mafê navnetewî yê zarokan tanî bi 18 saliya temenê wan di Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekgirtî de hatiye çesipandin. Ev li Elmaniya ji sala 1992an ve kar pê tê kirin û ji sê beşan pêk tê:

- Mafê Xizmeta Dabînkirinê: Bo nimûne li vir Mafê zarok î ji bo dabînkirina xizmeta tendurustî, ya xwendinê û jiyaneke bi şert û mercên guncayî.
- Mafê pişikdariya- kultûrî û Pêzanînan: ko em wan bo nimûne bihijmêrin. Mafê azadiya derbirînê, mafê ji bo parastina pergalên şexsî û kesayetî an mafê hebûna demên bêhinvedanê.
- Mafê Parastinî: Bo nimûne çend maf hene xwe di bin de dibînin, maf ê bo xweparstinê ji bikaranîna tund û tûjiya laşî/fîzîkî û giyanî, mafê xweparastina ji bikaranîn ne di cih de ya destdirêjiya cinsî û bikaranîna xerab ya aborî û cinsî.

## YASAYA MALBATÊ DI PIRTÛKA YASAYÎ YA SIVÎL DE



Yasayên neteweyî yên li ser maf û erkên dê û bavan li hember zarokên xwe, di *yasaya malbatê de, di Zagona Sivîl* de, têne danîn. Li gorî vê yekê, hebûna kesekî êdî ne tenê bi malbatê ve girêdayî be, lê bi piştgiriya dewletê têtê ewleh kirin. Dê û bav ji zarokên xwe re wek çavdêriyên herî girîng têne hesibandin. Hûn di hêla yasayî de bi tenê berpirsiyariya ko rewşa zarokên we baş bibin hildigirin.

Yasayên giring di pirtûka yasaya sivîl de:

- Dê û bav erkspartdar in, ko zarokên xwe yên temenê wan nekamil xwedan bikin (§ 1626 paragraf 1). Ev yasa „taybet bi erk û mafê xizmet û xwedankirina zarokî, perwerdekirin, çavdêrî û man û destnîşankirina cihê mayînê" bend e (§ 1631 paragraf 1).
- Divê herdû dê û bav lênêrîn, çavdêrî û xwedankirina zarokî bikin wî karî bikin, ko di xizmeta jiyaneke xweş bo zarokî bi rê ve biçe (§ 1627). Dê û bav herdû di standina biryaran de berpirsiyar in û mafê wan tê de weke hev e.
- „Pêdivî ye dê û bavê zarok î bihêzbûna wî û hewcedariyên wî bo bi serbixwebûna dan û stendinê li ber çavan deynin" û ji hêla dê bavan ve were têgehiştin. Pêdiviye pirsa xwedankirinê ji hêla dê û bavan ve bi zarokî re were guftûgokirin û li gor delîveya pêk ve bi zêrok re biryar werin wergirtin (§ 1626 paragraf 2).

**Giring:** „Mafê zarokan heye, ko jiyaneke dûrî ji tundûtujiyê bijîn û werin xwedankirin. Rê bi tevdîrên kêmkirina nirxî, mîna sizayên laşî, birîndarkirina giyanî nayête danê." (§ 1631 paragraf 2). Dê û bav dikarin bizavên karîger ên laşî/fîzîkî li ser zêrok bi kar bînin bo zarok were parastin. Bi karanîna her taşeyekî ji tundûtûjiya laşî/fîzîkî bo perwerdekirinê weke alavekî sizadanê, qedexe ye û dikare bibe sedema gilihlêkirinê.

## PIRTÛKA YASAYA SIZADANÊ (STGB)

Hemî serederî bizavên hayjênebûnê yên dê û bav an mirovên din ên bi xwedankirinê re têkildar in, pê radibin û ên di wê rê ye tundî an işkence li zarokî dikin, ew li gor pirtûka yasaya sizayê „bikaranîna şaş a mirovên di bin parastinê de ne" yasa wan li gor (§ 225) siza dide. Ew paşguhxistina zirarmend li xwedankirina zarok î û pejirandin an wê dikare lê bibe sedema ziyaneke tendurustiyê.

# 2. Tundûtûjî li dijî zarokan

Hemî zarokên cîhanê mafê wan parastina ji tund û tûjiyê heye. Di gel wê jî hîn mîna berê tundûtûjî li dijî zarokan heye. Ev di rêka wan mirovan re tête bi kar anîn, ên ko bo zarokî cihê baweriyê ne û ew her roj di gel wan kesan jiyana xwe bi ser de dibin: di rêka dê û bavan an xizim. Bi taybetî metirsî li ser Zarok ên kêmendam heye, ji ber ew hinekî kêmtir dikarin xwe biparêzin.

## ÇI TAŞE JI TUND Û TÛJIYÊ SERKETINA PERWERDEHIYÊ ASTENG DIKIN?

Şêweyê tundûtujiyê dikarin gelekî ciyawaz bin.

### TUNDÛTÛJIYA LAŞÎ

Tundûtûjiya laşî/fîzîkî tê wateya hemî êrişên li ser yekparêzî û selametiya laşê zarokî, ne girêdayî bi ka çendî şidet heye an şûna wê diyar e an jî nediyar e.

Nimûne:

- Lêdan, neqûçik, pihîn, dehefdan an destxistina qirikê
- Derb an birîndakirina bi tiştekî hişk, bo nimûne melkes, qarîş an cama şikestî
- Hejandina zarokên biçûk
- Şewata bi ava gerim an şewata bi hin tişt û alavên gerim
- Jehrîdan

### TUND Û TÛJIYA GIYANÎ/DERÛNÎ

Li dema tundûtûjiyeke derûnî êrîş rasterast li laş nabe û birîndar nabe, lê belê giyan, ew mirov û nirxê kesayetî yê zarok.
Ev dikare di rêya gotinê, nîşanekê an serederiyê pêk were. Li dema tundûtûjiya derûnî zarok di bin barê hestên neyênî de dinale. Û dema encamên tundûtûjiya derûnî/giyanî ne dîtbar bin jî, wisa di pêşdeçûna bêtir de, zarok dikar ziyanên zor xerabtir bibîne.

Tundûtûjiya derûnî/giyanî taşeya herî bêhtir e ji tûndûtûjiyê li dijî zarokan. Ew bêhtirê caran di perwerdehiyê de bi kar tê û gelek caran encama giraniya kar û erkan e.

Nimûne:

- Qêrîn
- Piştguhxistina pirsênzarokî, awireke tûj an berê xwe jêguhertineke heşkere
- Kilîtkirin, bo nimûne yê Odê
- Gefxwarin mîna: „eger tu niha bêdeng nebî, êdî wê tiştekî xerab biqewim. Eger tu careke din weha bikî, ez ê te dûr bikim, te bikujim."
- Bêqîmetkirin, rûreşkirin mîna: „Ez nema ji te hez dikim, ji ber çavên min here. Tu bi kêrî tiştekî nayê! Ma min çi guneh kiribû, ta zarokekî mîna te ji min re çêbû?"
- Sûcavêtin mîna: „Tenê ji ber te ez nebaş im. Eger tu serederiya xwe baştir nekî, êdî ez ê bi sedema te nexweş bikevim. Eger xwedê tu nedabana, niha rewşa me baştir bû."

## TUNDÛTÛJIYA CINSÎ

Tundûtûjiya cinsî hemî serederiyên tundrewiyê bi xwe ve digire, ên mafê çarenivîsa mirovî tekane a cinsî birîndar dike, weha li dijî azadiya daxwazên wî encam dide. Her serederiyên cinsî ji hêla dê û bavan an her mirovekî mezinî din ê bi wan re têkildar bi zarokan re an li pêşiya wan, ji kokê de qedexe ye û yasa wê siza dike, tanî ko di gel zarokî li ser hatibe dengkirin an nikaribe li ber xwe bide. Encamên zor xerab ên tundûtûjiya cinsî hene, dikare bibe sedema nexweşiyên fîzîkî û derûnî/giyanî heta hetayê.

Nimûneyên tundûtûjiya cinsî:

- Pelandina cihên gerimkirinê, sing an qûn bo livandina hest û nestên cinsî ên xwe
- Kişandina wêne-an girtina Video yê zarokî bi laşê tazî û rût
- Guvaşê li ser zarok deyne, dako li endamên wî ên cinsî binhêre an jî destê xwe bide wan
- Bi kîrê xwe, tiliyên xwe, zimanê xwe an jî her tiştekî din be derbasî laşê zarokî bike (Destdirêjiya cinsî)
- Guvaşê li zarokî bike, dako serederiya cinsî di gel mirovekî din re bike

## PAŞGUHXISTIN

Paşguhxistin şêweyekî pasîv e ji birîndarkirina zarokî re. Dê û bavan baş guh nadin zaroka xwe an jî li gor pêdivî be. Daxwaz û pêdiviyên zarokî ji ber vê guhnepêdanê ko demek dirêj bikêşe û dubare bibe pêk nayên, ko dibe sedema ziyandana zarokî. Encama herî xerab ya guhnepêdanê ko bibe sedem mirina zarokî, bo nimûne, zêde berçî an jî tî bibe.

Nimûne:

- Xwedankirin tune be di gel kêmxwarinî, laşê zarok î baş neyê pakijkirin, metirsiya ko jê kêm haydar û ne li ber çav be.
- Hezkirin û dilpakî tune. Sinorên maqûl nayene destnîşankirinê. Bo nimûne, rê bi zarokî tê dan ko rojan gelek demjimêran li ber Televiziyonê bimîne an li ser Komputer bilîze. Tiştên bive û metirsîdar nayên nîşandan, bikaranîna dermanê hoşber an karên sizabar têne pejirandin û rê pê tê dan.
- Pişkinîn û fehsên nojdariyê û dermankirin û tîmara pêdivî ji zarokî re nayê kirinê
- Piştgiriya pêwîst di karûbarê dibistanê seredana wê, erkê wê. Rêdan bi reva ji dibistanê û piştgiriya wê.

## ENCAMÊN VÊ TUNDÛTUJIYA LI SER PÊŞDEÇÛNA ZAROKÎ ÇI NE?

**Bertekên derhal ji zarokan bermaber tund û tûjiyê dikarin ev bin:**

- Şokbûn, hişkbûn/tevzînok, berteknedan
- Tirs, xof, qêrîn
- Girîna dirêj
- Hatîhev
- Berxwerdan, li derdoraxwe-xwe-lêdan, xweveşartin
- Tevlîhevî

**Dikare karîgeriya Dem nîvdirêj-û demdirêj bibe:**

- Xwevekişandin, bitenêmabûn
- Windakirin bingehîn û ya hundurîn
- Nemana motîvasiyonan, nemana heziya yarîkirinê
- Xemnakî
- Tirseke zêde
- Xwegirtina bi dê an kesê lênerîner
- Parastina ji ê lênerîner
- Astengîbûna pêşdeçûnê, têkçûna mezibûnê
- Vegera li şêweyê serederiya kevin, bo nimûne bixwedemîstin an vegeriyana li axaftina zarokatî
- Têkçûna xewê, neçûna dibistanê, têkçûna liserrawistanê
- Xwebiçûknirxdîtin, lixwebiguman
- Nîşandana tundrewiyê, bêhintengiya zêde
- Tevgera xweziyandanê, bo nimûne têkçûnê xwarinxwarinê, kişandina dermanê hoşber, çixarekişandin
- Xwebirîndarkirin, xwekuştin

**Encam, ziyanên demdirêj û ziyanên mayînde**

- Nexweşiyên fîzîkî giran, bo nimûne êşiya serî- gerde/mîde- azarên piştê
- Hestên reşbîniyê ji jiyanê
- Ecizbûna ji zaynedê xwe, bêhtirîn car ev encama serederiya tundûtûjiya cinsî ye
- Bixwe nirxnedan
- Nepejirandina têkiliyên civakî, tirsa ji têkiliyan
- Dubarekirina nimûneya wan têkiliyên neyênî
- Rêdîtina ji tiştên bûyî re û dana mandelayê
- Hizrên xwekuştinê, metirsiya ji xwekuştinê

**Karîgeriyên li zayendên taybet:**

Pirê caran li nika keçan karîgerên hundurîn têne çavdêrîkirinê, bo nimûne:

- Bêewleyî
- Xwe bi şûn vekişandin
- Ziyandana bi xwe, xwebirîndarkirin
- Tirs
- Xwedûrxistina ji têkiliyan

Li ba gencan karîgerî pircaran ji derve tê çavdêrîkirin, bo nimûn:

- Pejirandina tund û tûjiyê
- Serederiya serdest
- Nenirixdan bi keç û jinan û nerêzgirtina wan
- Êrîşên cinsî bi kar û peyvan
- Bêhintengiya zêde bilind
- Serederiyên tundrew û serederiyên tehdîdker

Berevajî ji gencan hîn zarok xwe di qûnaxa pêşdeçûnê de dibînin. Eger zarokek tûşî tund û tûjiyê bibe, êdî wê encamên xerab ên wê li ser laşê zarokî û derûna/giyanê wî û kesayetiya wî weke mirov li dirêjiya jiyana wî hebin.

## ÇIMA TUNDÛTÛJIYA JI HÊLA MALBATÊ VE TÊ XWEDAN ENCAMÊN TAYBET IN?

Malbat ew cih e ji bo zarokî, ko li wê derê gerek e hestê ewlehiyê li def hebin. Serboriya zarokî di gel tund û tûjiyê li wir çêbibe, êdî ew hestên ewlehîbûnê winda dibin. Ew berevajî wê fêrî, nepijirandin û tundûtûjiya li nav malbatê dibe û li nav wan mirovên nêzîkî wî ko normal be. Dê û bav û kesê têkildar xwe nîşan didin, ka dinyayê li ser wan çawa bertekan dide. Di nepejirandinê an tundûtûjiyê de, zarok hest dike, ko ew di vê dinyayê de nepêdivî ye. Ev dikare bibe sedema, zarok êdî nema bendewarê hezkirin û dilovaniyê ji mirovên din be. Ew bi rengekî neyînî an gumanbar li hember kesên din tevdigerin.

Ji ber tundûtûjiya malbatê, zarok tengasiyeke hestyarî, derûnî/giyanî ya mezin dibînin. Ew bi tenê nikarin xwe ji mirovê têkildar ê sereke ê ko bi wan ve girêdayî xwe dûr nexin. Carinan piştî tûndrewiyê yekser ew mirovê têkildar/lênêrînker bi dil û can serederiyê di gel zarokî dikin. Ev dibe sedema nerazîbûn û tevlîhevbûna kaosa hestê zarok î. Zarok herdem li şaşiyan li ba xwe digerin, heya ko dikaribin û çêdibe, ko dest bi xwe nefretîbûnê ji xwe bikin.

Pirê zarokan xwe li ber tund û tûjiyê radigirin, ji ber naxwazin ji malbatên xwe cuda bibin. An jî dikevin bin fişara dê û bavên xwe, dako tiştekî ji kesekî din re nebêjin.

## ZAROK WEKE ŞAHHIDÊN TUND Û TÛJIYA NAV MALBATÊ

Şêweyekî taybetî ji tund û tûjiya derûnî/giyanî li pêşiya zêrok, dema tûnd û tûjî ji hêla dê û bavan ve bi kar were. Zarok dikevin bin barê lêdanê, riswakirinê an jî destdirêjiya ser wan, dema ne rasterast jî di gel wan were kirinê, lê ew tenê pê hest bikin, pê bibihîzin. Bo nimûne, dema zarok li odeya xwe bin û tundûtûjiyê bi kar were, deng an jî qelebalix were guhê wan. An dema pergala nerehet li nav malbatê de hest pê bikin, ko di navbera dê û bavan de tiştek bûye.

Tundûtûjiyê li ba zarokan atmosfêreke tirsê diafirîne. Tirsa, ew bi xwe bibe qurbana tundûtûjiyê. Tirsa, ew bi sedema tundûtûjiyê dê û bavê xwe winda bike. Ew hest bi gunhiyê dikin an jî bêhêz bin, ji ber ko nikarin rê li ber tund û tûjiyê

bigirin. Bi sedema tund û tûjiyê di navbera hevpişkan de, ew ji hêla dê û bavan xwe ve, tişta pêdivî ji balkêşiyê, lênêrînê û hezkirinê bêpar dimînin. Hestekî wisa tevlîhev bi wan re çêdibe, ji ber ew di wê kêliyê de hem hez ji dê û bavên xwe dikin û hem ji wan hez dikin. Ew şerim dikin, an tevî hev dibin, ji ber nikarin têbigehin, çima tund û tûjiyê di nav wan de çêdibe.

Ji bo zarokekî, ko tundûtûjiya nav hevpişkan de bijî, metirsî li ba wî bilind dibe, ew bixwe tûn û tûjiya hevpişkiya bijî, mîna sûcdarekî an mîna qurbaniyekî.

Tundûtûjiya di dema zaroktiyê de, di nav malbatê de rû dide karîgeriyê li jiyana mezinahiya ya zarokî dike. Ev dikare wan nimûneyên perwerdehiyê ên hatîne fêrkirin di demên pêşde hevjînîtiyê û di nav malbatê bi xwe de dubare bibin. Da ko careke din tundûtûjî rû nede, parastina zarokan û perwerdehiyeke tendurust giring in!

## ÇI KARÎGERIYA CENGÊ, DERBEDERIYÊ Û TRAUMAYÊ LI SER PERWERDEHIYÊ HEYE?

Hemî cureyên tund û tûjiyê yên bi navkirî yên derveyî malbatê jî, dikarin di rêya cengê an jî derbederiyê de rû bidin. Ev serpêhatiyên tundûtûjiyê jî nêzîkî wan encaman ji bo zarokên têkildar çêdikin û bi kûrhaî kartêkirinê li serederiyên wî dikin. Li vir jî metirsî zêdetir dibe, ko di demên bi pêş de yê têkildar bi xwe tundûtûjiyê bi kar bîne an jî be qurbanê wê. Di dema tevdîrên xwedankirinê û di perwerdehiyê de pêdiviye van serpêhatiyên bi tundûtûjiyê û trauma re li ber çavan bêne wergirtinê.



# 3. Tund û tûjiyê di Perwerdehiyê de

Bi karanîna tund û tûjiyê weke alavekî perwerdehiyê her dem encamên xerab bi xwe re tînin û ji ber wê jî ev li Elmaniya bi yasayê qedexe bûye. Bi sedema serpêhatiya bi tund û tûjiyê re metirsî bêhtir dibe, ko di encamê de nexweşiyên fîzîkî û derûnî/giyanî peyda bibin, zehmetiya li dibistanan bibînin, bi xwe tund û tûjiyê bi kar bînin û bibin qurbanê/a wê.

Di gel encamên wê ên xerab, hîn carnan ji hêla dê û bavan ve berxwedan di ber tund û tûjiyê de dibe mîna alavekî perwerdehiyê.

## MA TUN Û TÛJÎ DIKARE BIBE ALAVEKÎ PERWERDEHIYÊ?

**Zarokê bi karekterekî xerab ji dayîk nabin, ew ê di rêka bêhtirbûna tund û tûjiyê di nav mezinan de şêweyê xwe werdigire.**

Zanistê çesipandiyê, ko kartêkirineke bi hêz li zarokî ji hêla mirovê li der û dorên dijîn de, li ser wî dibe. Bêhtir zarok bi çavlêkirin û wekwankirinê fêr dibin. Eger li malê zarok fêrî rêzgirtinê û hezkirinê bibe, wê ew li yê beramberî xwe rêzgirtin û hezkirinê nîşan bide. Eger zarok li ser tund û tûjiyê, fêr, mezin û perwerde bibin, wê fêr bibin bi zorê û tund û tûjiyê bijîn, û di jiyana xwe de wê zorî û tund û tûjiyê bi xwe bi kar bînin. Lê di heman demê de, di gel ko di perwerdehiyê de pir bi dilovanî serederî di gel dibe, lê dikare cira wî hîn jî nexweş be, bo nimûne ew bîbîka gelekî digirî, an zaroka li der û dora xwe dixe. Bêguman ji bo vê jî sedemek heye, dibe di destpêkê de neyê naskirin. Ev dikare bo nimûne nesaxiyeke derûnî/giyanî be. Li vir giring e, ko dê û bav alîkariyê bo xwe peyda bikin.

**Mafê perwerdehiyê nayê wê wateyê, ko zarok guhdar bin û pêdiviye xizmetkarê dê û bavan bin-**

Zarok serbixwe ne, tu ji wan kêm nîne û ne mulk û mewdanê dê û bavê xwe ne. Guhdarîkirin ne her dem nîşana rêzgirtinê ye, lê belê dikare ev ji tirsan jî çêbibe. Eger têkiliyên di navbera zarokan de û dê û bavan de li ser bingeha bikranîna desthilatê û desthilatdariyê de be, gelek caran dibe sedema ko hest li def zarokî baş mezin nebûne, ko bibe mirovek cirxweş. Ev ji bo pêşdeçûneke baş û tendurust pir giring e. Di serpêhatiya tund û tûjiya di qunaxa zaroktiyê de, ko zarok dê û bavan nepejirîne an destpê bike , kînê ji wan bigire. Ev dikare bibe sedema peydabûna têkçûn û bêhintengiyê, yên ko yên qels dijîn. Lê eger zarok bi temen mezin be û bi fîzîk bi hêz be, metirsî têdetir dibe, ko zarok li beramberî dê û bavan tund û tûjiyê bi kar bînin an jî xwe ji wan dûr bikin.

**Hinek dê û bav hene zarokatiya xwe bi tund û tûjiyê derbas kirine û di heman bawerî de ne: “Evê tund û tûjiyê ziyan li min jî nekir”. Ev wî mafî nade, ko mirov**

li beramberî zarokên xwe tund û tûjiyê bi kar bîne.

Tund û tûjiya li zarokan her tim şopê li pey xwe dihêle, ne giring e bi çi şêweyî be, çiqas be an çendî dijwar be. Tund û tûjiyê ne pêdivî ye, dako pirsgirêka di gel zarokan bi rêkûpêk bikin an jî sinoran nîşanî zarokan bidin. Eger bi kar anîna tund û tûjiyê ji aliyê dê û bavan ve weke çareseriyekê weke tevdîr were wergirtin, zarok jî vê gelek caran mîna şêweyekî serederiyê werdigirin. Hin rêber û kurs hene mirov bi wergirtina wan dikare, ka çawa mirov dikare sînoran li zarokan re deyne, fêr dibe û wan bi hêz dike, bêy ko tund û tûjiyê bi kar werîne.

## LI DEMA ZÊDEYÎ KARÎNA BE Û BELEGAZ BE DIKARIM ÇI BIKIM?

Di rewşên bêhintengiyê de bi kar anîna tund û tûjiyê li hember zarok û gencan dikare pêk were. Bo nimûne, ko dê û bav bêkar bin, mana wan ne misoger be, cihê wan teng be, trauma bi wan re hebe, ji welatê jêhatî çê bûbe an di rêya revê de û nehatibe çareserkirin, nexweşiyên giran, an pirsgirêkên di nav hevjînan de, hestbûn bi nekarînê û belengaziyê kirin, ka çawa nema bikaribin kontrolê bikin. Ev hemî gelek caran li dar dikeve, bê ko bixwazin an jî hizr li ser sedemên bi kar anînê bikin. Serdestîbûn û belengazî dikarin çêbibin jî, dema bo nimûne, dema xwedankirina çir ya zarokekî kêm endam dê û bavê xwe bigihîne wî sînor î ko ew êdî nema ji heq derkevin û ne bizanibin, çi delîveyên din hene.

Tişta bi giştî alîkar, xweamadakirin hizirkirin ji bo rewşên aloz ên werin: Çawa dikarim bê tund û tûjiyê bertekiyê bidim? Ma gelo ma alîkarî kir, di rewşeke stirêsane de cih bihêlin û ji dih ta bi bîst caran hilmê kûr bikişênin û berdin. Di rewşeke wisa pir bargiran de û pirsgirêkeke malbatî giran de wê vehesîtir be, ko mirov berê xwe bide saziyeke şêwirmendiyê, hineke alîkariyên yasayî ên tên pêşkêşkirin û şêwirmendiyê xizmet an heval û xizman bo wergiritina alîkariyê.

## ÇAWA DIKARIM ZAROKAN BI RÊKA PERWERDÊ BI HÊZ BIKIM?

Ji bo weke dê û bav pêşdeçûna zarokan bi hêz bikin, pêdiviye, têkiliyên bi hezkirineke mezin bi kar bînin û berdewamiyê bidin wê xizmetê. Tişta vpê ve girêdayî: Pesnê zarokî bidin, bo bihizkirin, baş guhdiya wî bikin, wî bihedinînin, wî ber bi singa xwe ve bikim û li dema pevçûn û kêşeyekê ji nirxê zarokî kêm nekin.

## ÇI PÊDIVÎ YE JI PERWERDEHIYÊDI PEY DERBEDERÎ Û PENABERTIYÊ ZANIBIM?

Penabertiya di welatekî din de, dikare ji bo malbatekê bargiraniyên taybet bi xwe re bîne, ên dikarin karîgeriyê li ser perwerdehiya zarokan bikin. Ev dibe sedema dûrbûna malbatê ji hev, her endamekî malbatê li cihekî cuda, Ji ber hinek ji wan li welêt dimînin an ser rêka derbederiyê ji ber hev winda dibin.

Careke din gihiştina malbatê di pey wê jihevveqetana çêbûyî, dikare pir aloziyan bi xwe re bîne. Pêdiviye ji nû ve erkên perwerdehiyê û rola her yekî di nav malbatê de were belavkirin û rahênekirin. Tişta pêdiviye, ko her zarokekî li gor temenê wî guhpêdan pê were kirinê.

Bîr û baweriyên kesayetî di derbarê malbatê de, zarokan de û perwerdehiyê de bi kartêkirina nirxên civakê, kultûra olê û serpêhatiyên zaroktiyê yên te bi xwe ve girêdayî ne. Di rêwîtiya ji welêt bo welatekî din, mirov bîr û baweriyan jî bi xwe re dibe, lê ew carinan di gel hizir, raman, rêma û yasayên civaka nû neguncin. Ji ber wê yekê jî nelihevkirinek di navber wan yên mirovî bi xwe re anîne û yên di civaka nû, derveyî ên malbatê çêdibe. Bo nimûne pêdiviye zarok xwe di baxçeyên zarokan de, dibistanan de, peymangehên pîşeyî de, xwe li gor raman û daxwazên nû biguncênin. Di gel wê jî ji bo zarokan hêsanî tê, ko ew xwe li gor vê jîngeh û rewşa nû biguncênin. Ew fêrî zimên dibin, lê netenê ew belê nirxan û rêmayên wê civaka nû lê bi cih bûyîn û pirê caran zûtir ji dê û bavan.

Eger dê û bav bi hişkayî bi irf, adet û tîtalên xwe ve, yên bi xwe re anîn, bê hinekî sist bikin, bigirin, bêy ko daxwazên welatê nû ên lê bi cih bûne nas bikin, dikarin tûşî pirsgirêkên mezin û bargiraniyeke berdewam di hundurê malbatê de. Ev kartêkirinek mezin li zarokan dike, ko pêdiviye di navbera daxwazên dijber de ên di hundurê malbatê de tên e xwestin û ên li derveyî wê divêt biryar were wergirtin. Ji ber wê zarok û genc, di cîhanên kultûrî cuda de dijîn, ji ber wê jî li çareseriyan digerin, dako bi tevdîrên weke hev di navbera malbatê û derveyî wê bikaribe jiyana xwe bi rê ve bibe.

Pêdiviye dê û bav li ser rewşa perwerdehiya zaroka xwe li jiyan û serpêhatiyên zarokên wan li derveyî malê pir agahdar bin û ji wan re alîkariya wan bo peydakirina çareseriyekê bikin. Bi giştî ne her tiştekî ko mirov bi xwe ji welatê jê hatiye aniye xerab e an baş e. Û weke wê jî li ser welatê nû derbas dibe. Ji bo geryana çareseriyeke bi wate, guft û go ya di gel perwerdekaran, mamosteyên jin an mêr û mirovên têkildar di baxçeyên zarokan de, dibistanan de an jî peymangehên fêrbûna pîşeyan dikare alîkar be.

Ev guft û go nirxandina karmendên di baxçeyên zarokan de, dibistanan û navendên fêrbûna pîşeyan de jî kar dikin, dike û navtêdanê dike ji bo bi hev re karkirina di warê perwerdehiya zarok û gencan de. Cihê ko bi hev re were axaftin, serederî were kirin û kar li ser bi hev re gehiştina armancekê, şopa lingê bêhintengiyê, bêrêzgirtinê û neserketinan tun e ye. Berovajî wê perwerdehiyê: li mezinbûneke tendurust, bextewer, bi hêz û serkeftî bo zarok û gencan heye, ko dê û bav pê serbilind û kêfxweş in. Ji bo dê û bav bi hêz bibin, ji ber ko ew di zarok ên xwe têdigehin, û zarokên wan jî, hest dikin, ko alîkara wan dibe û têne fehemkirin.

# 4. Parastina zarokan li Elmaniya

Di jiyana malbatê ya bi hev re, ne her dem û rojane, jiyan bê pirsgirêk derbas dibe. Eger pirsgirêk an tund û tûjî gelek caran bibin an jî eger rewşa jiyanê bargiraniyek be, xwestina alîkariyê ji saziyên xizmetguzariya şêwirmendî- û lênêrîn û piştgirî dikare pir alîkar be. Ji bo wê jî li Elmaniya hijmareke mezin, pêşkêşiyên jiyawaz hene. Bi kar anîna van alîkariyan çu kartêkirinên neyênî li ser bi rê ve çûna penaberiyê û mafê manê tune ye.

## EZ KARIM ALÎKARIYÊ BIKIM?

### PÊŞKÊŞIYÊN ŞÊWIRMENDIYÊ

Şêwirmendî tê wateya, ko di gel mirovekî pispor li dor rewşa xwe bi xwe an reweşa di nava malbatê de were axaftin. Ew hemî bi hev re li delîveyan bo başkirina rewşê bigerin. Ev dikare axaftineke rû bi rû, an li ser telefonê, bi E-Mail ê an Chat be.

Di Elmaniya de, bi tevayî 1000 ximetên şêwirmendiyê ji bo malbatan û perwerdehiyê hene. Hinek ji wan taybet in bi şêwirmendiya malbatên derbeder- an serpêhatiyên bi penaberan re.

Ew mirov ên şêwirmend nabe li agahiyên hun didin ji kesekî din re mukur were. Ew heme axaftinên şêwirmendiyê li dar ketin an êw nivîsên di rêka E-Mail, Chat re, nabe bo hinek din werin veguhestin. Tenê yek reweşeke awarte heye, dema yê şêwirmend bigihe wê nirxandinê, ko ew kesê şêwirê werdigire, metirseyek lezgîn li ser jiyana wî kesî heye an jî xweşiya jiyana zarokekî di bin metirsiyeke pir de ye. Eger hun gelekî ne ewle bin, her li destpêka guftûgoyê şêwirmendiyê pirsên xwe bikin, ka di rewşên destnîşankirî de, pêdiviye pêzanînê têne danê bigihin destên cihên din ên pispor. Delîve jî heye, ko mirov şêwirmediyeke nediyar, nepen bike, ko dikare li dema navdanê, pêdivî bi navdanê nebe.

### BIJÎJKÊ/A ZAROKAN

Eger di çavdêriya li dor mezinbûn an pêşdeçûna zarokî nebawerî hebe an têbînî li ser lebt û tevgera wî hebe, hun dikarin şîretekê ji bijîjkî/ê werbigirin.
Bo nimûne, dema ko zarok tim qêrîna bide, dema zarok neaxive, dema zarok gelekî bêhin teng be û qeherî be an zarok seqetiya wî hebe.

### KURSÊN PERWERDEHIYA JI TUND Û TÛJIYÊ AZAD

Di gelek cihan kurs têne pêşkêşkirinê, di wan de dê û bav dikarin fêr bibin, ka çawa bê bikaranîna tund û tûjiyê dikarin perwerde bibin. Li wir pêzanînên li dor pêşdeçûnê û pêdiviyê zarokî têne fêrkirinê. Li wir bertekên guncayî di rewşên zor û aloz de û rêkên çareserkirina pirsgirêkan bi şêweyekî azad û dûrî tund û tûjiyê têne nîşandan. Di eynî demê de delîve hene, bi malbatên din ên beşdar re serpêhatiyên xwe veguhêrin. Hinek kurs hene ko ji bo dê û bavên serpêhatiyên wan bi penabertiyê re hene têne pêşkêşkirin.

## TERAPIYA DERÛNÎ

Eger dê û bav ji hêla derûnî/giyanî ve bikevin bin bargiraniyekê, dibe terapiyeke derûnî pêdivî be. Sedemên ji bo wê jî dikarin bo nimûne ev bin: serpêhatiya xerab ya kesayetî di dema zaroktiyê de, tund û tûjî- û encamên cengê, xemîniyeke zor û gumkirin an bikaranîna xerab ya meyxuriyê, dermanan an dermanên hoşberiyê. Dermankirina bi terapiya derûnî wê ji hêla bijîjkan vewere nivîsandin û sendoqa nexweşiyê bihayê wê bide. Tiştê di dermankirinê de tête fêrkirin, çawa mirov serederiyê bi serboriyên bargiran, hest û hizir bike, ko jiyaneke rojane çawa bi rê ve diçe û delîveya pewerdehiya zarokan careke dinê were kirinê.

## ALÎKARIYA LEZGÎN

Di rewşeke tund û tûjiyê lezgîn de dikare telefon ji polîsan re weree kirinê di bin Nr. 110 bêper re, zarok jî dikarin bikin. Polîs mecbûr in bi lez werin, ji bo alîkariya kesên têkildar bikin.

Dema tund û tûjî di nav malbatê de rû bide polîs dikarin mirovê tund û tûjî kiriye 14 rojan ji xaniyê hemî tê dijîn bavêje (qewirandin). Ên polîs dikarin mirov ê tund û tûjî kiribe ji bo demeke destnîşankirî dixe hevsê, da ko bikaribin wê qewirandina ji xênî cih bi cih bikin.

Li dema karekî sizabar de li pey pirtûka yasaya sizadanê pêdiviye polîs li dijî wê mirovê tund û tûjî kirî dozê veke.

## ÇI RENG JI ALÎKARIYÊ SAZIYA ALÎKARIYA ZAROK- Û GENCA PÊŞKÊŞ DIKE?

Ji bo dê û bav di rewşên bargiranî û aloz de, li dema perwerdehî û xwedîkirinê alîkariya zarokîbikin û ewleh bibin di pêvdeçûna tendurst a zarokî de, bi alîkariyên yasayê ve girêdayî têne pêşkêşkirin. Ev „alîkariya perwerdehiyê" di *pirtûka yasaya civakî ya alîkariya zarok- û gencan de,* hatiye şirovekirin (SGB VIII). Eger dê û bav hest bikin, ku di perwerdêhiyê de pêdivî bi piştgiriyê hene, dikarin li ba Nivîsgeha gencan (Jugendamt), yadaşê bo „Alîkarî bo Perwerdehiyê" pêşkêş bikin.

Ev pêşkêşiyên alîkariyê bi şêwe û mezinbûnên gelek cuda hene û divêt di gel pêdiviyên malbatê bigunce. Bo nimûne dikare pişikdariya di pêdagogiyeke civakî ya koman de ji bo zarokan were kirin. Lê dikare bibe alîkar bo hemî malbatê, di rêya karmendekî pispor di warê pêdagogiya civakî de, ew ya malbatê gelek caran di heftiyê de seredanê malê bikin. Ev karmendê pispor dikarê alîkariyê di warên Perwerkirinê de, kêşeyên rojane, dîtina çareseriyan di tiştên di hev negehiştî de, an seredana dezgeh û saziyên mîrî de bike.

Ji bo were xuyakirin, eger an kîjan şêwe ji alîkariyê pêdivî ye û digunce, pêdivî bi rûniştineke şêwirdarî heye, ko li ser rewşa malbatê û rewşa zêrok, delîveyên çareseriyê û rengên cuda ên alîkariyê, ser li dor bi hûrbînî were axaftin. Ev guftûgoyên şêwirmendiyê li cihê nivîsgeha gencan

yên li wê deverê berpirsiyar têne dîtin, yên dikarin li wir jivanên guftûgoyan werin danînê. Pirê caran navê wan saziya „Xizmetkarên civakî ên giştî" an „kar û barên civakî ên şaredariyê". Ew karmendê saziya/nivîsgeha gencan ne rêpêdayî ne, ko bi sedema guftûgoyek wisa ya şêwirmendiyê zarokan ji nava malbatê bibin, eger metirsiyeke wisa giran li ser jiyana zarokî newe dîtinê.

## KENGÎ SAZIYA GENCAN DIKAR MAYTÊKIRINÊ DI PERWERDEHIYÊ DE BIKE?

Welat dikare li gor destûra bingehîn (Mada 6. Paragraf 2, hevoka 1) û pirtûka yasaya sivîl (§ 1666) di rêya karmendên saziya gencan an di rêya dadgeha malbatê re hinek erk û mercan ji malbatê re destnîşan bike, dema jiyana zarok an malbatê bikeve metirsiyê û dê û bavan mecbûr bike, ko wan karan nekin.

Ev erk dikarin li gor pirtûka yasayê ya sivîl (§ 1666 DGB) bibin:


- Pêdiviye mirov alîkariyên giştî bo nimûne wan xizmet û alîkariyên bo zarok- û gencan, alîkariya dê û bavan an xizmetên tendurustiyê (bo nimûne Pişkinînên parastinê) werine kirin û wergirtin
- Pêdiviya dê û bav bizavê bikin, ko zarok ji bilî dema ko (nexweş be) seredana dibistanê bike (Erkê çûna dibistanê bi cidî bigirin).

„teqeziya wergirtinê" wate derxistana zarokî ji nav malbatê tenê di rewş û pirgalên gelekî kêm de dibe. Têkilî bi dê û bavan re, ji bo pêşdeçûna zêrok pir giring e, ji ber wê jî armanca karmendên pispor ên saziya gencan, xwe parastin ji teqeziya wergirtinê, di rêya tevdîr û pêşkêşiyên piştgirî û alîkariyên din ji bo dê û bavan, re.

Tevlîbûna saziya gencan û ciwanan ti têkiliya wê bi yasaya sizayan re tune ye. Saziya ciwanan bi gelemperî ne mecbûr e ko dozan veke û gilî bike. Ya giring xweşiya zarokan e.

# Ferhengok

| | |
|---|---|
| **Pirtûka Yasaya Civakî (SGB)** | Yasaya hemî mafên civakî ya li Elmaniya bi xwe ve digire, her wisa alîkariyên dewletê û xizmetên piştgiriyê dixe çarçewê rêmayan, dako mirov bikaribe jiyaneke bi keramet bi rê ve bibe, dema ko hêza wî tenê têrê neke, bo nimûne di warên alîkariyê bo Zarok- û gencan de, mukumkirina erkan an alîkariyên civakî. |
| **Pirtûka yasaya sivîl (BGB)** | Ev yasa di derbarê yasayên kesayetî bi giştî, wate serederiyên yasayî di navbera mirovên prîvat de li Elmaniya. Naverok jî dikeve ber yasayên malbatê di gel çend teqezkirinên yasayî derbarê peymana zewacê û- ya berdan û ji bo mafê dê û bavan di xwedankirinê de. Ev pirtûka yaysayî ya sivîl bi tevayî dikare di Internêtê de www.gesetze-im-internet.de/bgb bi (elmanî) were dîtin û li vir www.gesetze-im-internet.de/englisch_bgb/index.html (bi Engilîzî). |
| **Pirtûka yasayê ya sizadanê (StGB)** | Ev yasa tawana cînayetkar ya li Elmaniya heye û encamên wê ên yasayî. Mirov dikare pirtûka kamil ya yasaya sizadanê li toreya Internet ê li van malperan bibîne www.gesetze-im-internet.de/stgb/index.html (bi Elmanî), û www.gesetze-im-internet.de/englisch_stgb/index.html (bi Engilîzî). |
| **Yasaya Bingehî (GG)** | Zagona ji bo dewleta Elmaniya federal hemî wan hemî pêdiviyên sîstema welatî-û biryardana ser nirxan û ev di ser hemî rêzikên yasayî elmanî ên din. Ev yasaya bingehîn tev di Internêtê de dikarî bibînî www.bundestag.de/grundgesetz (bi elmanî).<br>Wergerandineke yasaya bingehîn bo zimanên Arabî, Çînî, Engilîzî, Ferensî, îtalî, farisî, polonî, Rûsî, Serbî, Ispanî û Turkî, bo nimûne hun dikarin li ser vê malperê bibînin: www.spd.de/standpunkte/alte-unterseiten/fuer-unser-land-menschlich-und-weltoffen/grundgesetz-in-elf-sprachen |





# Adrêsên têkiliyê bo pêşkêşiya alîkariyê ên bijarte

## NAVENDÊN ŞÊWIRMENDIYÊ

### Bundeskonferenz für Erziehungsberatung e. V.

www.bke.de

Hun dikarin li Navendên Şêwirmendiyê bo babetên Perwerdehiyê û Malbatê li cihê xwe li wan bigerin. Malbatên penaber dikarin li pêşkêşiyê Navendên Şêwirmendiyê bi zimanê dayîk bigerin

### Deutsche Arbeitsgemeinschaft für Jugend- und Eheberatung e. V.

www.dajeb.de/beratungsfuehrer-online/beratung-in-ihrer-naehe/

Hun dikarin li cihê xwe li Navendên Şêwirmendiyê û bi rêka telefonê û Online ê û şêweyên pêşkêşiyên wan bigerin. Bo nimûne bo şêwirê di babetên jihevcudabûn, berdan an ji bo qurbaniyên her tund û tûjiyekê.

### Elterntelefon/Telefonên dê û Bavan

www.nummergegenkummer.de/elterntelefon.html
Tel: 0800 1110550
Du – În ji saet 9.00 – 17.00,
Sê, Pênc zêdetir ta bi saet 19.00

Şêwra nepenî bi zimanê elmanîji bo dê û bavan, Li dor hemî pirsan û xizmetan di meselên perwerdehiyê û malbatê de. Delîveya navberiyê ji bo cihê şêwirmendiyê li cihê we heye

### Kinder und- Jugendtelefon/ Zarok û- Telefonên gencan

www.nummergegenkummer.de/kinder-und-jugendtelefon.html
Tel: 116111
Du – Şemî ji Saet 14 – 20

Şêwirmediya bi telefonê ji bo zarok û gencan li Elmaniya, li ser hemî pirs û xem ên kesayetî. Delîveya navberiyê li Navdên şêwirmediyê li cihê we heye.

### Pêzanînên bûna Dê û Bav/ Elternsein Info

www.elternsein.info

Alîkarî û şêwirmendî ji bo ducanan û dê û bavên bi zarokên ta bi 3 salî

### Online-Beratung für Eltern durch die Bundeskonferenz für Erziehungsberatung/Şêwirmendiya- Online ji bo Dê û Bavan di rêka Koneferensa Federal ji bo şêwirdayîna Perwerdehiyê

https://eltern.bke-beratung.de/views/home/index.html

Şêwirmendiya Online- Nepenî bi zimanê elmanî ji bo babetê Perwerde, Jiyana malbatî, Baxçê zarokan, Dibistan û genc di sinêliyê de

### Online-Beratung der Caritas für Eltern und Familien/Şêwirmendiya- Online ya Caritas ji bo Dê û Bavan û Malbatên

www.caritas.de/hilfeundberatung/onlineberatung/eltern-familie/start

Şêwirmendiya Online- Nepenî bi zimanê elmanî ji bo babetê Perwerde, Jiyana malbatî, Baxçê zarokan, Dibistan û genc di sinêliyê de, bê dirav

### Dê û Bav-Nameyên pêzanînan li dor mijarê Perwerdehiyê

www.ane.de/download

Nameyên komelê „Xelekên kar ji bo perwerdehiyek nû“ pêşniyaran li dor Perwerdehiyê, ko di gel temenê zarok î guncayî be dide. Hun dikarin bê pere bixwazin an jî Download bikin.

### Eltern-Informationsfilme zum deutschen Bildungssystem

www.ane.de/elternfilme

Kurtefîlmên komela „Xelekên kar ji bo perwerdehiyek nû“ agahiyên didine dê û bavan ji zarokên ta bi 10 salî li dor Sîstema Zanebûnê. Ziman: Erebî, Elmanî, Frensî, Engilîzî, Spanî û Türkî

### Filmê agahiya-Dê û bavan ji bo rewşên perwerdekirinê

vimeo.com/channels/fmdvids/222248624

Ev Kurtefilme ya saziya „International Rescue Committee“ pêzanînan li dor zehmetiyê di rewşên perwerdekirinê ên heyî de û pêşniyarên xwe jî, ka çawa mirov serederiyê bike pêşkêş died.
Ziman: Englisch/Engilîzî

## KURS ÊN- DÊ Û BAVAN

### Pêzanîn û Video ji bo Kursên- Dê û Bavan li Elmaniya li ser vê malperê

https://elternkurse.com

### Kurs „Starke Eltern – Starke Kinder/ Kurs a „Dê û Bav ên bi hêz- Zarok ên bi hêz”

Pêşkêşiyên Yekîtiya Parastina Zarokên Elmaniya/Deutschen Kinderschutzbund e.V.
www.sesk.de/CONTENT/vorort.aspx

### Kurs ên „bihêzkirina xwedîkirina dê û bavan"

Pêşkêşiyek ji Peymangeha-Bihêzkirina-Perwerdehiyê ji bo kesên Pedagok (AKF) di bin
www.kess-erziehen.de/elternkurse-kess/migration

## ALÎKARIYA DÊ Û BAVAN YÊN ZAROKÊN WAN KÊMENDAM

### Berhevok a „Zaroka min kêmendam e- Ev alîkarî heye”

Ev berhevok a Kombenda federalî ji bo Laş- û gelekcar mirovên kêmendam = des Bundesverbandes für körper- und mehrfachbehinderte Menschen e.V. e. Pêzanîna li dor xizmetê, ko ji mirov ên kêmendam li Elmaniya re derdikeve. Ev weke Download heye û bi van zimanan hene: Elmanî, Türkî, Rûsî, erebî û Vêtnamî li ser vê malperê
https://bvkm.de/ratgeber/mein-kind-ist-behindert-diese-hilfen-gibt-es-in-mehreren-sprachen

### Berhevoka „Mafê xemlêxwarinê li Elmaniya”

Saziya Xemlêxwarina transkulturell e.V. pir pêzanînên nivîskî bi gelek zimanan mîna erebî, engilîzî, ferensî, yewnanî, îtaliyanî, polonî, rûsî, serbiyanî-kiroatî- bosnakî, ispanî û turkî li ber destan ddideyne.
Hun dikarin bixwazin û peya bikin di bin navnîşana vê malperê de.
https://itb-ev.de/broschueren

# Parstina zarokan di rêka perwerdehiya azad ji tund û tûjiyê

## Ev Rehber bo malbatên Penaberan

Ev Rehber pêzanînan li dor babeta Perwerdekirina bê tund û tûjî û mafê zarokan li Elmaniya himbêz dike. Em dixwazin di rêka vê berhevokê re xwe bigihînin mirovên pêrwerdekar ên debeder û nû penaber bûyî.

Em pêzanînan li dor tiştên bên pêşkêş dikin:

• Awa û encamên tund û tûjiyê li dijî zarokan
• Qunaxên pêşdeçûn ji zaroktiyê ta bi temenê gencatiyê
• Rê ji bo piştevaniya pêşveçûn perwerdehiyê
• Adrês û pêşkêşiyên alîkariyê ji bo Dê û bav û perwerdekaran

Ev Rehber di çarçoveya projektekî seranserî Elmaniya bi navê Projekta „MiMi-Gewaltprävention mit Migrantinnen für Migrantinnen/MiMi- libergir" hate pêşde birin. Hu dikarin vê Rehberê bi van zimanan werbigirin: Erebî, bulgarî, darî, elmanî, farisî, ferensî, kurdî, paşto, polonî, rûsî, serbî/bosnakî/kiroatî, spanî, û turkî heye û hun dikarin ji van malperan ji vê malperê „www.mimi-gegen-gewalt.de" û „www.mimi-bestellportal.de" bixwazin

Bi alîkariya:

Die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

DHBW Duale Hochschule Baden-Württemberg Villingen-Schwenningen Department of Mental Health and Addiction

Sächsische Landesvereinigung für Gesundheitsförderung

Landkreis Marburg Biedenkopf

bipoli Bildungspolitische Initiative e.V.

Stuttgart

AWO Interkulturell Vielfalt verbindet!

AJC Berlin Ramer Institute

Verband Kinder- und Jugendarbeit Hamburg e.V. Fachverband für die offene Arbeit mit Kindern und Jugendlichen

Kreis Gütersloh weltgewandt & bodenständig

Ev rehber tê dan ji hêla: